Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (246) | Hezîran / 1-6-2023

# Bacên PYD barê dukandaran giran kiriye




Kurdistan-Can Xidir
Li Kurdistana Sûriyê, roj bo rojê pirsa bacan û zêdebûna wan li ser dukandaran dibe rojev, Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYD bacên xwe li dukandar û bazirganan zêde dike, ev yek bûye cihê dilgiraniya wan, ew ji vê rewşê bêzar in, daxwaza çareseriya vê rewşa xerab dikin.
Dukandarek ku nexwestiye navê xwe eşkere bike ji Rojnameya Kurdistan re wiha got”Ew roj bi roj bacan li ser me zêde dikin,

> **«Zêdekirina bacan rewşa welatiyan zehmet dike»**

bi rastî ev yek bargiraniyek li ser me jibilî dana pereyên miwlîdeyê û dana alîkariyên bi zorê ji endam û kadirên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK, lê pirs ew e li hemû welatên dunyayê bac ji bo pêşxistina welatan e, lê li cem e kes nizane ev pere diçin pîrîka kê, heta niha ti xizmetguzarî li nava bajar nînin, û bajarên me wek yên salên 1970yan in. Welatiyek din jî dibêje, di vê dema dawî de merc û şertên zehmet danîne ser xwedanên dukan û kompaniyên hewlatan yên şandina pereyan ku ev yek jî wek ew dibêjin malwêraniyeke ji wan re bê ti misogeriyekê daxwaza pereyên zêde dikin, niha pirsa herî mezin ev e û helbet heger van mercan pêk neynin dê rastî astengiyan werin, û nikarin karên xwe berdewam bikin, ew dixwazin ligel her kesî şirîk bin.
Welatiyek dibêje, pirsa ewe gelo heger rojekê ji rojan rejîma Esed vegeriya dê dukandar van herdu bacan bidin û hin ji wan niha du bacan didin, ev yek cihê pêkenînê ye,

> **«Perê bacan li ser çi tê xerckirin?»**

Pêwîste welatî, dukandar bê deng nemînin û dijî vê rêveberiya xwe sepandiye xwepêşandanan bikin û derfetê nedinê bi kêf û heza xwe bacan li ser xelkê bisepîne, ev rêveberî û ev partî dema dibîne xelk bê deng e û bi tirs e, zêdegaviyan dike û ti hesabê ji kesî re nake, divê milet bi yek dengî dijî wê derkeve.

---

**« Deriyê sînorî ji bo berjewendiyên siyasî tê bikaranîn»** *Rûpel—2*

**60 sal Serok Barzanî Pêşmerge ye** *Rûpel—3*

**Gora Mele Ehmedê Namî hate veguhestin** *Rûpel—4*

# « Deriyê sînorî ji bo berjewendiyên siyasî tê bikaranîn»



**Kurdistan**

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) radigihîne, PYD ji girtina deriyê sînorî yê di navbera Kurdistan Sûriya û Herêma Kurdistanê berpirs e. Emîndariya Giştî ya ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, PYD deriyê sînorî Sêmalka ji bo berjewendiyên xwe yên siyasî û berûvajî berjewendiyên gel bi kar tîne û ew di ber girtina vî dergehî de berpirs e.

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS daxwaz ji Emerîka û aliyên peywendîdar kir ku bi erk û berpirsyaretiya xwe di vê derbarê de rabin.

> **Derî berûvajî berjewendiyên gel bikar tê**

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê di daxuyaniya xwe de behsa vegera Sûriyê bo nava Komkara Erebî û asayîkirina pêwendiyan kir û ragihand, biryara dewletên Erebî wê bihêle ku rêjîm astengiyan li pêş hewlên siyasî bo cîbicîkirina biryara navdewletî 2254 zêde bike.

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) tekez kir, bi tenê biryarên navdewletî krîza Sûriyê çareser dike. ENKSê destnîşan kir jî, ji bo avakirina Sûriyeyeke demokratîk, piralî û federal, divê di destûreke nû de ku azadiyên bingehîn û demokrasiya hemûyan garantî bike û mafên netewî yên gelê Kurd û hemû pêkhateyên Sûriyê nas bike.

> **Pêwîste Emerîka berpirsyaretiya xwe hilgire**

Di civînê de ENKSê rewşa Efrînê nirxand û tekezî li ser wê yekê kir ku pêwîst e Îtîlafa Opozîsyona Sûriyê û Hikûmeta Demkî pabendî sozên xwe yên derbarê komkujiya Cendirêsê di şeva Newrozê de bibin, tawanbar werin cezakirin û bandorên wê werin çareserkirin û çekdar ji deverên niştecihbûnê bên derxistin, û şert û mercên ewle ji bo vegera koçberan bo malên xwe werin peydakirin.

> **Divê çareseriya siyasî li gor biryara 2254 be**

# Şoreşa Gulan .. Şoreşa Destkeftan



Hîna Sedam Husên û Mihemed Riza Şahê Îranê bi serkeftina rêkeftina xwe şad nebûbûn, li “Dol Zewî” li sînorê Hacî Omeran, mefrezeyeke Pêşmerge şikestin bi rêkeftina wan anî û bi dengê tivingên kevin, 23 Pêşmerge rûbirûyî artêşa Iraqê bûn û Bexda û Tehran veciniqadin. Li zozanên Kurdistanê, dawiya meha Gulanê, xweza û keşûhewa xweş û geş bûbû. Ewa Bexda û Tehranê bîr lê nekiribûn, şoreş serî hilbide, lê Pêşmerge bi vegera bo çiyayan û destpêkirina şoreşê, mirina rêkeftina wan ragihand. Di tomara bizava rizgarîxwaza Kurd de 26ê Gulana her salekê, taybet e bi bîranîna serîhildana Şoreşa Gulanê ye. Şoreş di şert û merceke cuda bû, ku Kurd rastî şikestina derûnî, siyasî û serbazî bûbû. Zehmet bû di rewşeke wiha de, ku Şoreşa Îlonê piştî 15 salan di Adara sala 1975an bişike, careke din dest bi xebata çekdarî bibe. Lê nerîna serkirdeyên genc ên şoreşê, bi taybet Serok Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî, fermandarê meydanî di wê demê de karîn careke din xewna destpêkirina şoreşê bikin rastiyek. Bi navbênkariya Serokê Cezaîrê Hewarî Bomedyen di 6ê Adara 1975an rêkeftinek di navbera Cîgirê Serokê Iraqê yaw ê demê Sedam Husên û Şahê Îranê Mihemed Riza li perawîza kongreya welatên Opec li Cezaîrê rêkeftinek îmze kirin. Li gor rêkeftinê, Iraq razî bû kendav di navbera Iraq û Îranê de bê dabeşkirin û pirsgirêkên sînorî bi Îranê çareser bike, bi merca ku Îranê deriyê piştevaniyê di rûyê şoreşa Kurdan de bigire. Rêkeftina di navbera Iraq û Îranê de, bi piştevaniyeke Erebî û navdewletî destbikar bû û Kurd bi tenê li çiyayan man. Serkirdatiya Şoreşa Îlonê rêkeftina Cezaîrê bi plangîriyeke navdewletî li dijî neteweke bindest û şoreşa wê binavkir. Şoreşa Îlonê bi kirdarî hemû derî bi rûyê de hatin girtin û Îranê sînorê xwe daxist û rêgirî li gihîştina her cure hevkariyeke mirovî û lojistî girt. Hevdem jî Iraq hemû danûstandin red kir û tenê bijardeya xweradestkirina şoreşê xwast, di endamê de şoreşa Îlonê piştî 15 salan ji xebat û qurbanîdanê rastî şikestina serbazî hat, lê serkirdeyên xwe radestî Iraqê nekirin û li rêkeftina Cezaîrê mikur nehat. Bi hezaran welatî û Pêşmergeyên Îlonê wek penaber berê xwe dan Îranê û li kampên penaberande man û serkidatiyeke demkî bo birêvebirina karûbarên partî û şoreşê pêk anî. Li kampên penaberên şoreşê de li Rojhilatê Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurdistanê xwe birêk xist û dest bi dirustkirina pêwendiyan bi şane û rêxistinên pêştir ên li nava Iraqê re kir. Hevdem ji aliyekî din ve jî, çalakvanên siyasî dest bi avakirina grûp û rêxistinên siyasî kirin, ta valahiya ji piştî koçberbûna Pêşmerge û kadroyên şoreşê çê bûye dagirin. Herwiha di bin çavdêriya Rêberê Şoreşa Îlonê Mistefa Barzanî de, Serok Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî dest bi tevgerê kirin, ta meşxelê şoreşê vêxînin. Ji bo wê jî, piştî danîna bernameyekê û amadekariyên pêwîst, roja 26ê Gulana 1976an mefrezeyeke Pêşmerge ku ji 23 Pêşmerge bûn, li navçeya “Dol Zevî” rûbirûyî yekîneyeke artêşa Iraqê bûn. Her çend e, şer û pevçûnan yek demjimêrê dirêj kir, lê dawî bi serdema şikestinê anî û destpêkeke din ji şoreşa rizgarîxwaza Kurd re dirust kir û venemirî heta Kurd li Iraqê gihandin nêzîkî serxwebûnê. Destpêkirina şoreşa Kurd û vêketina Şoreşa Gulanê, bû destpêkek ji mirina yekcarî ya rêkeftina Cezaîrê.

# 60 sal Serok Barzanî Pêşmerge ye

Serok Mesûd Barzanî roja 20ê Gulana 1962yan, ango 61 sal beriya niha, tevlî rêzên Pêşmergeyê Kurdistanê bû û di 61 salên jiyana xwe ya pêşmergeyî de, her dem nirxên netewî û niştimanî parastine û di hemû pile û postên xwe de eşkere kiriye ku ew şanaziyê bi pêşmergebûna xwe dike. Serok Mesûd Mistefa Barzanî ji malbata Barzanî ye ku malbateke olî û niştimanî ya Başûrê Kurdistanê ye û ev malbata têkoşer, zêdetirî sedsalekê ye li qada tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê têkoşînê dike. Xebata malbata Barzanî bi rêbertiya Şêx Ebduselam Barzanî yê Yekem û Şêx Mihemed Barzanî û Şêx Ebduselam Barzanî yê Duyem û heta Şêx Ehmedê Barzanî bandoreke mezin li ser tevgera rizgarîxwaz a seranserê Kurdistanê kir. Bi rêbertiya Mela Mistefa Barzaniyê Nemir şoreşa Barzan derbasî qonaxeke berfirehtir û pêşketîtir bû û partî û saziyên serbazî û rêxistinî, bi awayekî bibandor ketin xizmeta tevgera rizgarîxwaz a niştimanî. Serok Barzanî di 16ê Tebaxa 1946an de li bajarê Mehabada paytexta Komara Kurdistanê jidayîk bûye, ev jî heman roj e ku Yekemîn Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li bajarê Bexdayê hat lidarxistin û General Mistefa Barzaniyê Nemir weke Serokê Partiyê hat hilbijartin. Bi destpêka êrîşa artêşa Iraqê ya li ser Başûrê Kurdistanê, roja 11ê Îlona 1961ê, bi neçarî xwendinê bi cih dihêle û roja 20ê Gulana 1962yan tevlî rêzên hêzên Pêşmerge dibe. Di navbera salên 1976 – 1979an de li



Amerîkayê di xizmeta bavê xwe Serok Mela Mistefa Barzanî de bû ku bi mebesta tedawiya nexweşiya xwe, li Amerîkayê bû. Serok Barzanî di sala 1979an de di Kongreya Nehem a Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) de, ji aliyê nûnerên kongreyê ve weke serokê partiyê hat hilbijartin. Sala 1983an, di Enfalê de 37 kesên ji malbata wî ligel 8000 kesên navçe û eşîra wî, ji aliyê rejîma Sedam Husên ve li biyabanên naverast û başûrê Iraqê hatin jinavbirin û di gorên bikom de hatin windakirin.

# Gora Mele Ehmedê Namî hate veguhestin




**Kurdistan**

Termê helbestvanê Kurd Mele Ehmedê Namî ji bo goristana gundê Til Şeîrê hate veguhestin.
Helbestvanê Kurd Mele Ehmedê Namî ku gelek helbest nivîsandine, gelek helbest bûne stran û navdar bûne, termê wî 20ê Gulanê ji Goristana Qedûr Begê li bajarê Qamişloyê ji bo goristana gundê Til Şeîrê ya Aşîtan birin.
Mele Ehmedê Namî kî ye
Mele Ehmedê Namî (1906-1975) li gundê Erbetê qeza Nisêbînê, Bakurê Kurdistana hatiye dinyayê. Heft salî bû dema di hicrika feqehan de dest bi xwendina Nûbihara biçûkan ya seydayê mezin Ehmedê Xanî, xwendina olî, Qurana pîroz û şerîetê kir û di hicrikên Êstilê, Kercosê, Dara, Hicrika Seyda Mele Ubeydulahê Cengîrî (yê bi navê Mamostê Gewr e dihat nask irin) li Amûdê, Xizna, Girê siwêr û Tilşeîra Aşîta. li van hicrikan xwendina xwe berdewam dikir û li hicrika Seydayê Şêx Îbahîmê Sofî Evdo li Gundê Tilşeîrê " îcaza Intîhayê" wergirt û bû melayê wî gundî.Mele Ehmedê Namî li gundê Tilşeîrê jiyana xwe ya civakî, torevanî û kurdewarî berdewam dike. Rola rewşenbîrekî Kurd bi giranî di dema xwe de dileyize, têkiliyên rewşenbîrî bi kovarên Hawar û Ronahî re girêdide yên ko Celadet Alî Bedirxan û Dr. Kamîran Bedir-Xan li Şamê û Bêrûtê diweşandin, helbest û nivîsandinên xwe di nav rûpelên zêrîn yên wan kovaran de diweşandin û dibû yek ji dostên nêzîk ji rewşenbîrên dema xwe re û di nav wan de Mîr Celadet Bedir-Xan. Wilo jî dikeve kom û komelên kurdewariyê de û di wan de dikeve nava desteka berpirsiyariyê de wek: Civata Xoybûnê, Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan, Civata Arîkariyê Ji Bona Belengazên Kurd Li Cizîrê û Nadiya Ciwan Kurd Li Amûdê. Malika gundê Tilşeîrê Aşîta ya Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan ko Namî berpirsiyariya wê dikir, bû bû xeleka dan û standinê û bi hevgirêdanê di nav bera Civatê û Partiya Demukrata Kurdistana Îraqê de. Namî yek ji şagirtên Mîr Celadet Bedir-Xan bû yên ko fêrkirina zimanê Kurdî danîbûn ser milên xwe. Namî dibistanek e şevê li gundê xwe Tilşeîrê û di odekê ji odên dibistana fermî de vekir bû, xort û kalên gund her şev bi terz û edeb di hundirê oda dersdanê de rûdiniştin û Namî mamostayê zimanê kurdî ew fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî dikirin.Mele Ehmedê Namî ne tenê xwe berpirsiyarê hînkirin û fêrkirina zimanê Kurdî didît, lê her weha wî bi her awayî şerê kewdeniyê jî dikir û doza rêkirina zarokan bo dibistanê ji dê û bavan dikir, nemaza ewên ko zarokên xwe rê ne dikirin dibistanan.Namî li gor wan bîr û baweriyan û ji bo bicîanîna armancên xwe, piştî vekirina dibistana fermî a kuran li gundê Tilşeîrê, êdî bi karekî bêwestan radibû, bi têkilî , dan û standin û doza bi xurtî ji berpirsiyarên birêvebiriya perwerdeya parêzgeha Hisiçe-Cizîrê- dikir.

Biryara vekirina dibistanek e keçan li gundê Tilşeîra Aşîta wergirt. Di sala 1951 an de, mamoste dibistanê, keçek e Kurd bû, şagirtên dibistanê her roj di civîna sibehê de, sirûda niştîmanî a Sûriya û helbesta Namî ya bi navê "Neşîd û Gaziya Keçan" digotin: Birayê delal hûn werin xortino Buhuşt e welat da´m herin merdino Eger hûn neyên vane keç em meşîn Besin koletî serfiraz da´m bijîn Welat çav li rê bendewarê me ye Ciwan herne pêş dewr û dem ya we ye.

# Westabûna bê sûd



Azad Haco Hemê

Dibêjin carekê mêşek difriya û li pozê gayekî danî, wî gayî zevî cot dikir tipabekî li ser pozê wî ma vegeriya nav girûpa xwe mêşekê jê pirsî tu li ku bû, gotê mi cot dikir ew girûp tev matmayî man lê ev çi dibêje, gote wan wek ez ji were dibêjim wan gotê ê çawa gote wan, min dît gayek zevîkî cot dike min li ser pozê wî danî heye cot temam kir, ez firiyam û va hatim, wê gavê girûpê tevî fêm kir mebesta wê mêşê û bi ber hişê wan ve hat, îca mebesta min jibibîranîna vê çîrokê ew e ku pirr ji mirovan jî hene mîna wê mêşê ked û westana xeyinî xwe dikin ya xwe bê şerim û fedî û çiqasî pirr bûne divê serdema menî nihade, mînak pirr in liser van markan yanî evanê ku ev pîşe di wan den e, tim dixwazin ku navê wan bi tenê bi bîr be û pêşeng bin, ew fermandar û qut bir bin, bêyî ku li hestê xwediyê kedê yê rasteqîn binêre an jê şerim bike û bêje ev tişkî herame ez çima wiha dikim Xweda jî vî tiştî na pejirîne, îca sedema vê babeta nehez dibe cihê ne razî bûn û xeyid û xirakirinê çi mal an dibistan an civak an partî an dezgeh û saziyên dewlet an welat be, di malê de wê yekî jêhatî û kedekar hebe dê û bavê wî nirxê wî nagirin wê birayekî wî dinê diser wî re bigirin, li dibistanê şagirtê zîrek wê sal pêde bixwîne xewa şeva lê diherime wê şagirtikî tiral di ezmonê de jê veguhêze wê biser keve wê xwe li ser yê zîrek paye bike.Di civakê de yê derew û vira dike lê guhdar dikin û pirr bi qedire. Di dezgeh an saziyan de dibê ti gendel be pere û reşwa ji xelkê bixwe heya sazî û berpirsê wê jite razî bin lê ku ti pak û paqij be îşê te nameşe û wê te bavên cihekî bêkêr. Wisa pirr ji mirovan jiyana xwe di domînin liser hesab û keda xeyinî xwe